Li xwe digerim

Silêman azer

Li xwe digerim,

û şev jî bi hilma min ve

digerin

sermaya van bakuran

daleqandî bi awirên te ve

min diparzinîne

gera tirşbûyî

ji goşiyên bêrîkirinan …

Bi çarlepkan,

derdoran digevizînim bînayiyan

li tenişt min

bayên bakuran

devdawa van cihên Pînekirî hildidin .

Li keviyeke di ser re çûyî

firindeyên serxweşiyan

dest bi guvaştinên min dikin…

Digerim

êvarin ziwa ji banandinan

lêvên sariyê,

bi sînga min ve dixemilînin.

Di tabloyên saldîde de

tozika bê rengiyê

Pêkan li windabûna min

dibarînin.

Li ber dergehê wê gerê

kunên ji hişçûnê

reşayiyê

diqurpînin…!!

silemanazer@hotmail.com